

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 140) Sal 23 23 Rêbendan 2019 z - 2630 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S


# Roja cîhanî ya mafên mirov... Bobelat û bêtarên giran

## Desteya sernivîser



Berî 70 salî mîna vê rojê, ango 10ê meha Berçilleya 1948an, ji bo danasîna mafên mirov li ser asta cîhanê û rêzgirtina bend û rêzên wê, Yekîtiya Netewan(UN) «Danezana Cîhanî ya Mafên Mirov» ragihandiye, ew a ku ji dîbaceyekê û 30 bendên cihî pêk hatiye. Wê belgeya dîrokî, rûmeta mirov û nirxên mirovatiyê bilind parastiye, wekhevî, dadmendî û azadiya mirov pesend kiriye.

Eger civaka navnetewî rêzê li bendên vê belgeyê bigre, her kes li ser rûkê vê zemînê dê bigihe mafên xwe, bi azadî, aştî û wekhevî bijî, û rê li pêş sitem, çavsorî, zêdegavî û şer bête girtin.

Di dîbaceya vê belgeya dîrokî de gelek xalên nirxdar hatine nivîsandin, mîna:

- Mikurhatin ku bingeha azadî, dadmendî û aştiyê di cîhanê de, rêzgirtin li rûmeta hemû endamên malbata ademîzadiyê ye, û çespandina mafên mirov ên wekhev e.

- Da ku mirov neçar nebe, li dijî sitem û zorê serî hilnede, pêwiste ku zagon mafên wî biparêze.

- Pêdivî bi çespandin û geşepêdana têkiliyên dostane di..........

2

# Di bîranîna roja Cîhanî Ya Mafên Mirov de Li Qamişlo... Piştgiriya Efrînê hate kirin

Bi helkefta heftêyemîn a Roja Cîhanê ya Mafên Mirov, li roja Duşemba 102018 /12/ Z, bi sedan dost û hevalên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) bo piştgiriya Efrînê xwepêşindanek lidar xistin.

Ji navenda Partiya me li tara Rojavayê Qamişlo û di Celda Siyahî ve derbasbûn berê xwe dane Navenda Nûnertiya Netewên Yekbûyî li bajarê Qamişlo, Di pêşiya xwepêşindanê de Ala partiya me û Ala rengîn, û li pêşya wan diruşmek wiha hatibû nivîsandin: (**Na ji dagîrkeriya Turkiya û binpêkirina mafan li Efrînê re).** Gelek wêneyên destdirêjiya çeteyên bi ser dewleta Turkiyê ve girêdayî û yeke mezin bi sê zimanan (Ingîzî, Erebî û Kurdî) jî weke :




- Guhertina Demografî destdirêjiyeke li ser mafê mirovan li Efrînê.

- Bikeve dagîrkeriya Turkiyê ji Efrîn û xaka Sûriyê re.

- Na ji..........

4

Hevpeyvîn

# Bi Sekreterê Partiya Pêşverû ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê... Birêz Hemîd Hecî Derwîş re

**Desteya sernivîser**

*Li destpêkê, bi navê destya sernivîser a weşana NEWROZ û xwendevanên wê, em xêrhatina we dikin, tenduristiyeke baş û jiyaneke aram ji we re hêvî dikin.*



Mîna hûn rewşa Kurdên Sûriyê dişopînin, ku vê demê ji hemû deman bêtir em di rewşeke xirab û ne xweş de dijîn, ji hêlekê, Herîma Efrînê berî nêzîkê salekê ji bal rijêma Turkiyê û hevalbendên wê ve hatiye dagirkirin, îro jî ew gefê li rojhilatê Feratê dixwe, diyar e ku çarenûsa gelê me di metirsiyê de ye.

***1- Gelo hûn mîna siyasetmedarekî Kurdî xwedî nav û dîrok û yek ji damezrênerên Partriya Kurdî a pêşîn li Sûriyê, û xwedî ezmûneke siyasî, xwendin, nirxandin û nerîna we li ser vê rerwşê bi gelemperî çiye?.***

**B 1**: Bêgoman, metirsiyeke mezin ji Turkiyê heye ku ew deverên Kurdî li Sûriyê weke Cizîrê û Kobanê dagir bike, bêxe bin destê xwe. Ez gelekî bi ciddî li vê yekî denerim û ez dibêjim dê Turkiyê bi karekî rabe, lê ew kar çiye û li kûderê destpê bike, ez wê yekê nizanim.

***2- Hûn biryara rêveberiya Emerîkayî seba vekeşîna hêzên wê yên leşkerî ji Sûriyê çawa dinirxînin?. Û gelo ew têkiliyên di navbera QSD û Artêşa Emerîkayê de bi yek carê herifîn, têkçûn, û rê li pêş artêşa Turkiyê bo derbaskirina***..........

3

**Roja cîhanî... Dûmahîk**

navbera dewletan heye.

Mixabin ku îro rewşa mafên mirov li seranserî cîhanê gelek paşve çûye, rêz û bendên Danezana Mafên Mirov di nava golên xwîna mirovan de li ber bayê diçin, û ji ber ku dewletên mezin ên cîhanê yên xwedî hêz û biryar pişta xwe dane vê danezanê, û berê xwe dane berjewendiyên xwe, ew belgeya pîroz bê rêz û bê wate maye, nirxên mirovatiyê li ber piyan çûne!, û rêxistina navnetewî lawaz bûye, tu rûmet ji qels û belengazan re nema ye, roj bi roj, ew dikevin bin nîrê bindestî, zor û sitemê, rê li ber pişaftina hûrgel, kêmnetewan û çanda wan dûz dibe, û her kes dizane ku windabûna wan ji bo çand û kultûra cîhanî ziyaneke pir mezin e.

Weke mînak, bi kurtî be jî, em dikarin rewşa welatê xwe Sûriyê di ber çavan re derbas bikin, çawa ku ev e nêzîkî 8 salan e şerekî gemar lê çêbûye, bi sedê hizaran mirovên bê sûc û bê guneh hatine kuştin, nîvê gelê Sûriyê ji cih û warî xwe hatiye hilkirin, penaber bûye, bi sedan bajar û gund ji kokê ve wêran bûne, bi sedê hizaran kes, çarenûsa wan ne diyar e …Û hwd. Li hemberî vê bobelata giran, rêxistina navnetewî nikare avekê li vî agirî bike!.. Ma gelo tê bawerkirin?!..Eger civaka navnetewî saxlem û bê êş ba, wê dikarî di yek mehê de vî şerî vemirîne û destê biratî û alêkariyê dirêjî gelê Sûriyê yê perîşan bikira û bihişta ku li ser lingên xwe raweste û welatê xwe ava bike, lê mixabin ku ew bûye qurbana şerê hêzên cîhanê û lîstik û xapên dwletên herêmê.

Ma gelo bi çi mafî û li gora kîjan zagonê li Avdara sala 2018an artêşa dewleta Turkiyê û pêxwasên ku navê «Artêşa Azad» li xwe kirine sînorên dewleta Sûriyê derbas kirine û herêma EFRÎNÊ ya Kurdî dagir kirine, talankirin, kuştin û revandina mirovan ji xwe re kirine karê sereke!..Bi çi mafî dewleta dagirker û çeteyên wê sembolên gelê Kurd şikandine, rûmeta gel a netewî îro binpê dikin, bi darê zorê gundiyan ji malên wan derdixin, Ereb û Turkemenan li şûna wan cîwar dikin!!..Ma gelo rêz û bendên danezana mfên mirovan li kû derê mane?. Ne tenê wilo, îro ev dewleta ku şerê gelê Kurd ji xwe re kiriye erkê sereke, gefan li hemû herêmên Kurdî dixwe da ku dagir bike, bê ku rêxistina navnetewî, xwediya danezana mafên mirov dengê xwe li berpirsên wê yên har û devbixwîn bike, û gelê Kurd ji kîn û zikreşiya wan biparêze!.

Di vê bîranînê de, ji me Kurdan tê xwestin ku em li xwe vegerin, rewşa xwe bi hûrbînî bixwînin û li ser rawestin, berjewendiyên gelê xwe bidin pêş û li hember neyarên hebûna gelê xwe li ber xwe bidin, bi hişmendî, aqilmendî biryaran werbigrin, û eger em vê yekê nekin, metirsiyeke mezin li ser gelê me heye. Tevî tarîbûna rewşa me, divê em bê hêvî nebin, bi dilsozî, bê dudilî, kar û xebata xwe bidomînin.

**Hevpeyvîn... Dûmahîk**

***sînorên welatê me hatiye dûzkirin?.***

**B2**: Di nerîna min de, peywendiyên QSD û Emerîka ne dirust bûn, ew peywendiyên rojane bûn, Emerîka mifaha (fêda) xwe di wan de didît û ew weke leşkerekî li dijî dijminên xwe bikar tanîn, û armancên xwe bi cih dikirin. Bi ya min, Emerîka tu rêkeftinên fermî stratîcîk bi QSD re nekirine û roja ku nema gerekê wan be, ew ê QSD li şûn xwe bihêle, xatir bixwaze û here. Ez dibêjim, em ê gelekî şaş herin ku em baweriyê bi Emerîka bînin yan ku ew ê tiştekî ji me re bike. Di vî warî de, ezmûna Berzanî bi Emerîka re diho pêr bû, hê jî ew li ber çavan e, çawa Kîsincir Berzanî li çolê hişt û çû, ew ê QSDê jî li şûn xwe bihêle.

***3- Tê ragihandin ku projeya anîna hêzeke Erebî ji Misir, Îmarat û Siûdiyê bo bakurê Sûriyê ketiye rojevê. Hûn çawa li vê nûçeyê dinerin?.***

**B3**: Ez bi xwe bawer nakim ku ew hêz bên. Emerîka dixwaze bibiêje va ye ez ê ji Sûriyê derkevim û ev hêzên ha dê şûna min bigrin. Ez bawer nakim Ereb bên têkevin Sûriyê şûna hêzên Emerîkî bigrin.

***4- Itîlafa Sûrî ya Stenbolê pesend kir ku ew nûnertiya gelên Sûriyê nake, werîsê xwe radestî hikûmeta Turkiyê kiriye, aşkere şerê mafên gelê Kurd dike. Û di dagirkirina herêma Efrînê de, hovîtiya xwe aşkere daye zanîn. Gelo di rewşeke wiha de, PYD û hevalbendên wê, ENKS, HEVBENDÎ û Partriya Pêşverû nikarin li hev rûnên, civînekê lidar xin, li hember dagirkeriyê rawestin, tevgere û çalakiyeke diblomasî li ser asta hundir û cîhanê bikin?.***

**B4**: Hatiye xuyakirin ku opozisyona Sûrî weke opozisyoneke serbixwe nema ye, ew ketiye destê Turkan, Turk wê dibin û tînin. Me jî, em û Partiya Yekîtîya democrat»El Wihde» xwest bi erkên xwe rabin û vî karî bikin. Me (34-) caran ji her du aliyan xwest ku carekê em li hev rûnên û bi hev re çareseriyekê ji vê rewşê re bibînin, dan û sitandinekê bi dewletan re bikin, da ku em tehlûkeya Turkiyê ji gelê xwe bidûrxînin. Lê, mixabin ku hevalên me di ENKSê û PYDê de jî beşdarî civînan nebûn û berisvine neyênî ji me re şandin. Aniha ez dibêjim, ew her du alî, di ber êşandina Kurdan de berpirsên sereke ne.

***5- Parta we destpêşxeriyek ji bo lidarxistina civînekê ji hemû aliyên tevgera siyasî ya Kurdî re pêşniyar kir, mixabin, her du aliyên ku nakokî di navbera wan de hene, beşdar nebûn?. Di nerîna we de, eger di rewşeke wisa aloz de em nikaribin li hev rûnên, çawa dê em ê karibin li pêş neyarên hebûna gelê xwe xebatê bikin?.***

**B5**:Ez jî weke mrovekî Kurd wê teqdîr bike eger em nikaribin li hev rûnên, gelo em ê karibin ji Kurdan re xizmetê bikin?!.Bi min na, ew ê nikaribin û ne dî bîra wan de ye ji bo Kurdîtiyê xebatê bikin. Eger di bîra wan de ba, wê bigotana ka carekê em li hev rûnên. Heta niha, nehatiye bîra wan em li hev rûnên , tenê hatiye bîra wan çilo şerê filankes bikin û çawa bêvankes dûrî tevgerê bikin, ew di bîra wan de ye. Ne di bîra wan de ye xizmeta doza Kurdî û bicihkirina mafê Kurd bikin. Vêca, ez bi hêvî me ku ev dawiya şaşiyên wan be, li xwe vegerin û siyaseteke nû bigrin, ne weke mirovê kor bê ronahî bimeşin.

***6- Diho pêr, destpêşxeriyeke din ji bal KNK ve hate ragihandin, gelo hêvî hene ew gav here serî?.***

**B6**: Ez bawer nakim ew gav biçe serî. Eger rast KNKê û hevalên xwe ji dil û can yekîtiya Kurdan bixwestana, wê yekîtî bi me re çêkiribana. Ew dibêjin eger ne li ser destê me be, yekîtiya Kurdan çênabe!. Ango, divê yekîtiya Kurdan ya KNKê be. Ez bi xwe jî nizanim ew yekîtiya KNKê dixwaze pêk bîne çilo ye. Weke mirovekî di siyasetê de dixebitim, ez bi xwe tê nagihim KNKê çi dixwaze û ez bawer nakim ji bilî min jî kesek têdigihêje. KNKê dixwaze tiştê baş ku ji aliyê partiyên Kurdî derkeve, nehêle ew here serî û wê bixeniqîne.

***7- Hûn paşeroja Sûriyê û pirsa Kurdî li welêt çawa dibînin?. Gelo ew bi ser çareseriyê ve diçe yan ewê aloztir û kûrtir bibe?.***

**B7**: Mirov dibîne ku



rewşa sûriyê berew xirabiyê bêtir ji başiyê diçe, ji ber ku heta niha, ronahiyek piçûk jî li cihekî xuya nabe ku rewş ber çareseriyê here, ji ber wilo ez dibêjim belkî rewş hê bêtir bi ser xirabûne ve here. Ez hêvî dikim dawî ji rewşa xirab re bê, îde bese…xelkê Sûriyê gelekî perşîn bûne, derbider bûne, bê cî û war mane, giringe dawî ji vî karê xirab re were, bese.

***8- Li dawiyê, tu dixwazî çi bibêjî mamosta?.***

**B8**: Ez ji NEWROZê re serkeftinê dixwazim û ji karmendên wê re pêşveçûnê dixwazin, hêvî dikim ku karibin di ragihandina Kurdî de roleke baş bibînin, ji gelê xwe û tevgera wî re xebateke baş bikin û bibin egerê peydabûna ragihandineke qenc û kêrhatî bo gelê Kurd û tevgera wî. Di nerîna min de, ragihandina Kurdî qels e, yah eye jî, xizmeta kesan û partiyan dike, ne xizmeta Krdîtiyê dike. Bi hêvî me NEWROZ yek ji wê ragihandina Kurdî be ya ku rê li pêş gel ronî bike.

***NEWROZ, spasiya we dike ku we ev dem ji bo wê terxandiye, her di xweşiyê de bijîn.***

# Ger em dixwazin Kobaniyê û Cezîr wenda nekin divê em li Efrîna birîndar Xwedí derkevin

**Memê Alan**

**Weke em tev dizanin ku dewleta Turkiyê ya dagîrker bi alîkariya hêzên leşkerî yên islamewî û radîkal û tundrew li roja 20.1.2018 li ber çavê civaka navdewletî û mirovahiyê û bêdengiya wan ya bi qebhet û şermoka, êrişeke hovane û har anîn ser Efrîna delal û bi aram û ewle, bê ku tu cudahiyê di navêna mirov, dewar, dar, mal, gund û bajaran kin. Bi bombe û balafiran tev dan ber xwe tar û mar kirin, şewitandin, zar û zêç, kal û pîr, xort ú keç û jin û mêr kuştin û bi hezaran şehîd û binaxkirin, yên mayîn jî bi sedhezaran ji cîzayînên wan bi derkirin. Li 18.3.2018an jî mîna gur û segên har derbasî Efrîna brîndar bûn, mal ú milk û kel û pelên xelkê me dizîn, şkandin, şewitandin ú talan kirin. Xelkê me yê derneketî jî girtin, işkence kirin, kirin hepis û zîndanan û pirek jî bi peran berdêl kirin, û li hin ciyan rûmet û namûsa Kurdan jî binpê kirin. Wan bi wê tenê jî bed nekirin, her çûn zulim û zora xwe li ser gelê me bi şîretkariya ìstîxbarata Turkiya Toran zêde kirin, da ku gelê me yê mayî jî terka axa bav û bapîrên xwe bike û ji wan re bihêle û here û li şûna wan kes û malbatên biyan ku ji hemû deverên Sûriyê hatine bi derkirin werin bi cîkrin, û guherîna demografî, çandî û dîrokî pêk were.Yanê Kurdîtiya Efrînê binpê û tune bikin. Ev ton siyaseta kirêt û ne mirovene hîn berdewam e û tima Turkiyê ne tenê Efrînê weha bike, li ber çava ye ew gef û gurên wê yên rojane ji Rojhiltê Ferêt re, yanê ji Kobanê û Cezîrê re û tevaya bakurê Sûriyê re jî. Ji ber ku armanaca wî ya salane tunekirin û binpêkirina gelê Kurd bi tevayî û gelê Kurdistanê ye. Bi ser tiştê hatî serê me Kurdan û metirsiyên li pêş jî, tê xuyan em hîn bi xwe nehesîne û deng û çalakiyên me yên siyasî, dîplomasî, ragihandinî û meydanî wek Tevgera kurdî pir lawaz, ne li hev û ne pilankirî ne, û yekcar ne di astsa berpirsiyariyê de ne. Ger weha here xwîşkino birano, ne tenê paşeroja Efrînê wendabûne, belê kobanê û Cezîr jî di metirsiyê de.Vêca pir pêwîste em Kurd îro berî siba ji xew rabin ú vê toza salane ji ser xwe daweşînin, dest bidin hev û li hember van ton pêlanên kirêt û gemarî yê dagîrkerên Kurdistanê bisekinin û nêlibin armancên xwe bi cih wînin. Ji ber ku dúr an nêzîk piştî guherînên li pêş Rojhilata navîn paşerojeke geş para gelê me ye.**

**Di bîranîna... Dûmahîk**

guhertinên cihên şaristanî.

- Na ji dizî û talana pilankirî û xirakirinê re.

Li destpêkê, Hevalê Cîgirê sekretêrê partiya me Mistefa Meşayix gotinek bi zimanê Kurdî pêşkêşî beşdaran kir, tê de amaje bi xirakirin, dizî û talanên ku li Efrînê ser destê çeteyên bi Turkiyê ve girêdayî dibin, û karên wan ên kirêt anî zimên. Hevalê cîgir teqez kir ku hovîtiya çekdarên bi Turkiyê ve girêdayî û zêdegaviyên wan, bi biryara dewleta Turkiyê ya dagirker dibin. li dawiyê, wî berxedana şervanên kurd (YPG û YPJ ) pîroz kir û dilovanî ji pakrewanên ku bi xwîna xwe ev xak parastine xwest.

Di pey re Heval Hisên Bedir endamê Komîta serkirdayetiya partiyê Nameya partiyê



ji Nûnertiya Netewên Yekbûyî re bi zima Erebî xwend.

Hêjayî gotinê ye ku ev name bi zimanê Erebî û Ingilîzî radestî nevenda ( UN ) bû, û ev e wergerandina deqa wê ye:

**Amîndarê Giştî yê Yekîtiya Netewan**

**Birêz Antonyo Gotêris**

**Silav û rêz…**

Bi helkeftina Roja Cîhanî Ya Mafên Mirov û ji ber zêdegavî û tawanên ku hêza dagirkera Turkiyê û çeteyên pêve girêdayî derheqa xelkên Efrîna dagirkirî dikin, em di Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ) de îro bi vê çalakiya protestokirinê li pêş Navenda we li bajarê Qamişlo-Sûriyê rabûne.

Dagirkerên dewleta Turkiyê û hevalbendên wê, hemû mafên mirov binpê kirine û hê jî dikin, kiryarina wisa kirêt ku mîna daxê ne di eniya mirov û mirovahiyê de. Ji ber ku armanca wan ew e bi rêya pêkanîna pilaneke şoven û regezperest, Kurdan ji xaka bav û bapîrên wan rakin û nijadine din li şûna wan cîwar bikin, biçînin… Ji ber wilo jî, ew hemû rengên girtin, azar, standina bacê ji xelkê, şewitandina dar û beran, wêrankirina şûnewaran û perestgehên kevin, û sepandina ziman û pereyên Turkî li ser xelkên deverê bê şerm û fihêtî pêk tînin!..

Û ji ber ku hûn aliyê fermî ne ku hûn dikarin dawiyê ji vê zor û sitemê re bînin, dengê xwe bilind bikin, guvaşê li ser dewleta Turkiyê bikar bînin da ku ew û çeteyên pêve girêdayî ji Efrîn û hemû xaka Sûriyê ya dagirkirî vekişin, da xelkên wê bi aramî vegerin warê bav û kalên xwe, em vê bangê ji we re rêdikin, û em bawer in ku hûnê aştî û dadmendiyê li seranserî Sûriyê belav bikin.

**Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd Li Sûriyê(YEKÎTÎ)**

10.12.2018

# Teror çi ye ?

**Nazdar Hesen**

Peyva terorê ji tirs û metirsiyê hatiye .Ew her kar û kiryarekî kirêt û tund e , yê ku gefê li jiyana mirov, milk û mewalên wî dide, di jiyana civakê de heyamekî bi tirs û ne aram peyda dike û pêkanînên ne rewa di dermafê mirovahiyê de dike û bi tu yasan pêbend nabe û dijberiya rêzgirtina mirovahî û olî dike , lewra jî em dikarin bibêjin pênaseya terorê bi kurtahî teror ne armanc û ne olên wê hene û ne jî pêbendiya tu yasan dike . Belê ev pênaseya her kes pê dizane, lê mixabin hin desthilatdar li gor berjewendiyên xwe terorê dinasînin û têkliyan vê re dikin . Ji ber wê jî di piropoganda van dewletan de, kesên ku ji bo parstina xak û miletê xwe berevaniyê dikin û dijberî teroran têkoşîn dikin, û wan bi terorê gunehbar dikin û hêzên me kurdî û piropoganda dewleta Turk û gefên wê yên rojane li ser Kurdan mînaka herî berçav e, û dagirkirina wê ji Efrînê re destpêk bû, û ew herêma herî ewle di Sûriyê de bû, û ya ku bi hezaran nîştecî û penaberên wê hembêz kiribûn, di bin perdeya rizgarkirina wê ji terorê, rê da komên teror ên bi destê vê dewletê hatine perwerde kirin û alîkariya wan dikir, êrişê bi tundî bibin ser vê herêm, bi kîn , kîndarî û



çavsorî wê talan û wêran bikin û ji xwediyên wê yên resen vala bikin û ta ku guhartineke demugrafî pêk bînin , kiryarên herî kirêt di dermafê kesên pêdar manî de dikin ji kuştin, girtin û lêdankirinê û di bêdengiya navnetewî de ta goristan, dar , kevir , çol û baniyên vê herêm ji ziyanên wan bê par ne mane. Belê di vir de em dikarin wek nîştecih û xwediyên Efrînê ji berbirsên mafê mirovahiyê bi gelemperî û ya turkî bi taybet bi dengekî bilind bipirsin : Ma gelo rewşa me berî dagirkirnê wiha bi tirs û ne aram bû ? - Ma wisa tu yasa tune bû û tukes pê pêben ne dibû ? - Ma ev kiyarên tund di dermafê tukesî de dibû ? –

Ma yê li Efrîn niha dibe ne teror e ?

- Û ger ne wiha be , ma teror çi yeee?

---

# Li Ser Koka Xwe Şîn Bibe

**Mihemed Qere Hesen**

Gava nêrî li keriya xwe nebane, tu bizin bi şîr pê nakevin. Li vê sed sala paşîn zimanê kurdî di warê nivis û fêrkirinê de pir bi pêşketî ye, tevî ku miletê Kurd bê dewlet e, ji ber ku karê fêrkirinê yên dewletan e ,li şûna wê rêxistin, sazî, komele û partiyan di astên nizim û ne fermî de ziman fêr kirin, wê jî hêşt ku qasnaqa xwêneran fere bibe, rojname û kovar jî pir çap bibin. Vê jî bi xwe re hejamara nivîskar, helbestvan, û rewşebîrên pispor û têvel pir kirin, wan jî asta nivîsê bi hemî şêweyan bilind kirin.

Bi emraz û têveliya nivîsê ya miletên hevjîn û cîhanê hukardar bûn û ew serpêhatî xistin rewşebîriya kurdî. Ew jî gavek xwazayî ye ku mirov û milet hukariyê li hev dikin. Lê hê çanda kurdî bûr e, û hêj pir derî lê nehatine kutin, zaf kar û nivîs pê gerek e, mîna deriyê wergeradinê çi wergerandina berhemên zimanên biyanî ji bo zimanê kurdî an jî wergerandina berhemên kurdî ji bo zimanên biyanî. Li vir rewşenbîrên netewa Kurd wê di rêya wergerê re wan miletan binas in, û li hêla din jî gava berhemên kurdî wergerin zimanên biyanî, ew dê milet Kurd binas in û wêjeya wî dê di nav



wêjeya cîhanî keve û cihê xwe bigire. Ev jî bi taybet kar û erka sazî û dezgehên zanistî ne, tevî ku hin kes bi cefayê xwe yê tekane li vir û li wir dikin û derfeta çapkirinê jê re tune ye û di veşariyê de dimînin. Lê hêjî hin rewşenbîrên Kurd hene serê xwe di rewşenbîriya miletên cîran de mijûl dikin. Ew kar ji wî milet û wê çandê re pîroz e, lê nabe sih ji giyana gelê Kurd re . Ji wan miletan re dimîne ku ew jê re pûtekî zêrî çêkin. Em tev zanin ku dewletên Kurd di bin destan de ne, bi şev û roj ew kar dikin, ku çanda me dêris bikin, ta roja îro ew li mafê Kurdan ên rewşenbîrî mikûr netên. Di vê tentêlê de rolên rewşebîran pirtir gewre dibin û uestbariyên xwe mezintir dibin. Li vir pirsek xwe çedike gewera çandê. Ma gelo rewşenbîrê Kurd bi vî karî ranebe, ma kî yê bike ? Vêca kar û bar di ustiyê lawên netewa Kurd de ne, bingeha wan kok û tamên zimanê kurdî ye ku li ser şîn bibin û ber bidin.

# Deklerasyona tifaqa hilbijartina herêmî

7 partiyên kurd û Kurdistanî yên ku di bin banê HDPê de tifaq li dar xistibûn deklerasyona xwe ya tifaqa hilbijartinê ji raya giştî re eşkere kirin. Daxuyanî wiha ye:

Ji ber ku hilbijartinên herêmî, ji bona desthilatdarîya heremî û bicihbûna demokrasîyê giring in, jixwe ji me Kurdan re ev hîna giringtir in. Hilbijartina 31ê Adarê ji ber hinek sedemên ku em ê li jêr bînin ziman hîna giringtir bûne.

1- Piştî pergala serokatiyê li Tirkiyê eşkere xuya dike ku parlamento ji derb de ketiye û pê re ji giringiya îdareyên herêmî hîna zêdetir bûye.

2- Desthilatdar, mixalefet û partîyên sîstemaTirkiyê, bi plan û programan bere xwe dane doza gelê me û dixwazin ku di mêjiyê gel de hinek têgihiştinên çewt bi cîh bikin. Ew dixwazin ku gelê me ev fikir bi wana re çêbibe; “ em herin ser sondaqan jî, em necin jî wê tu cudabûn çênebe, çawa be jî ew ê li şaredarîyan qayûm werin tayînkirin.” Bi vê têgihiştina çewt dixwazin gelê me ji siyasetê sar bikin, bi van dîtinên çewt gelê me ji xwe re dikin hedef.

3- Serokê MHPê Devlet Bahçelî derbarê Kurdan û hilbijartina herêmî li Kurdistanê dibêje; “heke Kurd careke din desthilatdariya herêmî ji destê qayûman derxînin, wê hinek daxwazên wana hîna kûrtir bibin. Ev jî wê Tirkiyê bibe devereke din. Ji bona ku em bikevin pêşberîvekê divê em eşîran têxin dewrê” Ango




Bahçelî dibêje bila Kurd hilbijartinan winda bikin, bila MHP jî hilbijartinê winda bike lê bila dewletaTirk winda neke.

4-Piştî ku pergala serokatiyê bi cîh bû desthilatdariya AKPê û rejîma Tirkiyê tenê bûye ya zilamekî. Ji bona ku em bikaribin bi hilbijartinên meşrû û îrada gel vê pêvajoyê derbas bikin, divê em karibin tifaqên gelekî berfireh li Kurdistanê pêk bînin.

Ji ber vê yekê em tifaqa xwe li Kurdistanê, li Tirkiyê û li Dinyayê, ji raya giştî re radigîhînin;

a) Em tevger û partîyên Kurdistanî ku îmzeyên me li jêr hene di bin sîwana HDPê de, di hilbijartinên herêmî de tifaqa xwe îlan dikin.

b) Tifaqa Cûmhûr ku dixwaze îrada gelê me careke din desteser bike û bi formûla ku dibêje “ Bila Kurd winda bikin” siyasetê dike. Li hemberî vê dîtinê em jî dibêjin “Bila Tifaqa Hilbijartina Kurdistanî û gelê me bi ser bi keve, bila partîyên me bi ser bikevin. Bi wan helwestan em dixwazin ku derfet û destkeftinên xurt bi dest bixînin.

c) Bi Tifaqa Hilbijartina Herêmî ya Kurdistanê em dixwazin sîyaseta sivîl-demokratîk xurt bikin, ji bona vê yekê em bi bawerî têdikoşin. Û ya herî giring jî em nirxên gele me yên netewî diparêzin û êrişên ku li ser gelê me hene di bingeheke sivîl-demokratîk de em li hemberî van êrişan derdikevin.

d) Di tifaqa hilbijartina herêmî de tevger û partiyên me amaje pê dikin ku di nava gele me de kultura hevkariya netewî-demokratik pêş de bibin. Dîtinên şaş ku di nava Kurdan de heta niha belav bûne, weke ku tê gotin “Kurd nikarin tifaqa bi hevdu re ava bikin”, Em dixwazin vê dîtina şaş di hilbijartinên herêmî de bişkînin, vala derxînin û li gora daxwaza gele xwe tevger bikin.

e) Di Tifaqa Cûmhûr de (AKP-MHP) dibêje; ji bona pêşeroja dewleta xwe em tifaqê ava dikin, lûksa me ku em ji hevdu bixeyidin tune ye, ji ber van sedeman em tifaqê çêdikin û li hev dikin. Em tevger û partiyên Kurdan jî nakokî û cudabûnên xwe paş de vêdikişînin û li ser nirxên hevbeş yên Kurdan em tifaqa xwe di hilbijartinên herêmî de radigîhînin.

f) Ya herî giring jî ev e, daxwaza Kurdan ku îro hemû gelê me dike yek, ango perwerde û fêrbûna bi zimanê dayikê di serî de û têkoşîna ji bona mafê çarenûsa netewa xwe ku me Kurdan hevbeş dike, bi vê hişmendîyê em ê di şaredariyan de helwesteke netewî - demokratik pêş de bibin. Di warê herêmî de em ê bixwazin ji gelê xwe re xizmetê bikin.

g) Kurdên ku di hilbijartinên herêmî de li derveyî tifaqa me tevger dikin, em rûmeta nişanî îrada wana didin û helwesta wana weke mafeke demokratîk dinirxînin. Lêbelê di van şert û mercên ku me bi kurtasî li jor anîne ziman, em dixwazin di hilbijartina 31ê Adarê de Kurd bi yek tifaqê bi hevdu re tevger bikin. Beşdarbûna Kurdan bi tifaq û bi hev re giringîyeke dîrokî ye û di berjewendiya gelê me de ye. Em ê heta dema dawî ji bona hilbijartina herêmî yekrêzî û tifaqa Kurdan biparêzin, banga xwe dubare bikin û bangî van hevalan bikin ku beşdarî tifaqa me bibin.

h) Em dîsa giring dibînin ku HDP di hilbijartinên herêmî de bi hêzên demokrasîyê li Tirkîyeyê re tifaqên berfireh ava bike.

Em ji raya giştî re bi rêz radigîhînin.

***Em bawer dikin û em ê serkevin***
***Wê gelê me/gelên me bi serkevin***
***Wê tifaqa me bi ser bikeve***
*Em ê bi ser bikevin.*

**Kurdistan İslami Hareketi (AZADÎ)**
**Demokratik Bölgeler Partisi (DBP)**
**Devrimci Demokrat Kürt Derneği (DDKD)**
**Halkların Demokratik Partisi(HDP)**
**İnsan Ve Özgürlük Partisi (PİA)**
**Partîya Komunîsta Kurdistan (KKP)**
**Platforma Demokratên Kurdistan (PDK)**
**Partiya Demokrata Kurdistanê-Tirkiye (PDK-T)**

*7 Ocak 2019*

# Serkeftin ji me re ye

**Semîre Bin Hesen (Tûnis)**
**Wergerandin ji Erebî:**
**Nûşîn Bêcirmanî**

Miletên bindest di kul, xem, êş û azariyê de, tev yek in, Di vê kurte nerînê de , tuşta ku gelê Emazîxî û Kurdî jê dikazin, ez dê diyar bikin.

Van herdû miletên resen, ku li ser xaka bav û kalên xwe dijîn, ji destê zordaran toşî gelek êş û cefa bûne û hê jî dibin, digel ku ew herdu xwediyên zemîna xwe ne, xwediyên mafên rwa ne. Di heman demê de jî xwediyên rewayetiyeke dîrokî ne. Zordarên ku mafê van herdu gelan binpêkirine û di gel hemû pilanên kirêt û tarîkirina jiyana wan, lê ewê nikaribin wan û doza wan ji zemînê rakin û tune bikin.

Bi şopandineke piçûk, mirov têdigihe ku gelek xalên wekhev di navbera me herdu gelan de hene.... Miletê Emazîxî li çar welatan parçe bûye ew jî evin : Tûnis, Cezayir, Mexrib û Lîbya ne; miletê kurd jî li çar welatan hatiye parvekirin kirin : Turkiya, Iraq, Îran û Sûriya, heman tiraceçîdî di navbera me de hevbeş e, em Emazîxî ji ber zordariya desthilatdarên van dewletan li seranserî qonaxên dîrokê ta niha jî me tu (insaf) û dadmendiya navdewletî nedîtiye, di gel ku rewşa birayên me yên kurd li Îraqê hinekî baştir e, lê piştî ku ji bo serxwebûna Kurdistanê rifrandom bi rengekî rêrxistinî kirin, da ku ji bin deshilatdariya navendî li Baxdayê riha bibin, astengî ji wan re peyda bûn..... çiku, em di rewşa Iraqê de taxivin, çi kiryarên ku Seddamê diktator û çeteyên wî dermafê birayên me yê Kurd di komkujiya Helebçê de û ji bilî wê jî , em van tucara jibîr nakin...Di Helebçe de, çekên kîmawî derbarê welatiyên bêguneh bikar anîn bêyî ku mirovahî di dilê wî de bilive...Lê demê dadmendiyê gotina xwe derbarê vî diktatorî got, ji desthilatdariyê hate dûrxistin û li dawiyê stoyê wî kete werîsê sêdarê û hate xeniqandin, ev bi xwe jî sezaya sitemkar û xwînmija ye...

Di gel ku komkujî û kiryarên hovane derbarê miletê me yê Emazîxî nehatine bikar anîn, lê ev nayê wê wateya ku tuşta tê serê birayê me yê kurd, û şer û cengên li pey hev ji bal rijîma Turkiyê, Zindankirina serwer Ebdula Ocelan li ser destê vê rijîma



xwînmij û hov, ev bi xwe nîşana pirsgirêk û azariya gelê Kurd bi hemî cûreyên xwe yên şoven e.

Herdû bobelatê gelê Kurd û Eamazîx, weke tê xwestin nelivandiye, di gel ku diyardeyên dîrokî xuya û berze ne derbarê mafê binpêkirî yê herdû gelan... Lê baweriya me ya hevbeş bi stûnên nasnameya xwe ya netewî û girêdana me pêve û xebata me ya domdar ta ku nasnameya me fermî bîte çespandin, ev jî dê bimîne hêmanê hêz û berxwedana me li dijî pîlanên gewre yên derbarê me têne ristin.

Bêguman, lîstokên netewan û pozbilindiya siyasetmedaran, pirsgirêka dadmend a gelên Kurd û Emazîxî bi paş de dane, lê vîna herdû gelên gewr e dê neşike, û li dawiyê, ewê serkeftî be!

## Weke ku....

**Helbestvan: Şêrîn Ebdo**

Weke ku ....
Tîrêj .....tariya şevê
Ji ser milên xulmaşiya
sibehê dadiweşîne
Çav û ebroyên te
Dostaniya awiran
Vedigijgijînin
Nihêrînan jî di şermiyê de
Dilolijînin

Weke ku ...
Esîmanê dilovan
Giyanên zindî
Di hembêza xwe de
Ber hev dike
Siha te jî wendabûnê
Bi gavine nenas re
Li rex sînorine biyanî
Li hev dicivîne
Û radiwestîne

Ez jî ....
Di kesera te de
Êşgehên xwe
Dixewînim
Lorandina xumexumê
Ji gewriya çêm
Direvînim
Bi vedenga CEMÎL HORO re
Di guhên DUDERIYÊ de
Vedijînim

Dibim taveke Buharê
Dilop bi dilop
Baranê ji memikên
ewran dinoşim
Bi daxwaza dîdarekê re
Bi ser lêvên hêviyên
miçiqî de dibarim
Lavayên xwe bi ser tîna
te de dibanînim

Awazê navê te
Di helbesta min de
Hestan ber ve xwe
Radikêşîne

Û ez .....
Li nav tîpên paşnavê te
Bêêê navnîşan dimînim

**Gotareke ... Dûmahîk**

xêr û namdariya te.


Ez Xwedê şikr û hemdî dikim piçekî xwendin û nivîsandinê dizanim, heke tu qebûl bikî paş niho, ezê qasidiya cerîdeya te bikim. Ev bajar, wek bajarê Kurda lê hatiye.Her salê deh pazdeh hizar Kurd li hire dicivin, rencberiyê, derîna dexlê dikin, gelik jî paşê dimînin, xwey mal û zaro dibin. Ji ber vê sebebê, ezê muhtaciya halê Kurda ji te re her car binivîsim. Xizmetek holê kiçik ji mîrê xwe re bikim.

**Atneyê**
**Seyid Tahirê Botî**

Ez ji wê kaxeza te rêkirî gelik memnûn bîm, Xwedê i›lm û himeta te zêde bike. Her car ezê pênî cerîdeya ji te re rêkim, lê çeku hikûmetê hê izna cerîdeya min nedaye, lewma ez nikarim bi posteyê rêkim. Ezê texlîdeke dî ji te re rêkim, bighînim destê te.

Paş niho jî inşallah, ez ê te›rîfa mezhebê şafi›î ji Kurmanca re bikim. Hekî tu her car behsa Kurmanc û halên wê derê binivîsî, ezê gelik minetiyê ji te hilînim.

# Pr. Dr Cemal Nebez Ji nav me bar kir



Komîta xelata Osman Sebrî, bi xemgînî koça dawî ya serokê komîtê yê berê ragîhand. Cemal Nebez roja 08.12.2018 danê sibê li Berlin a paytext ,bi temenê 85 salî xatir xwest. Cemal Nebez salin dirêj di kurdelojiya de kar kir û gelek berhemên zanist ji pirtûkxaneya kurdî re li şûn xwe hêştin.

# Gotareke bijarte ji Rojnameya KURDISTAN Hejmar »5»


عدد ٥

کردستان

١٣١٥

**Bi Pênûsa xwediyê wê:**
**Mîr Miqdad Bedirxan**
**Guhestina tîpan:**
**Newafê Bişar**

Gelî ulemayên Kurda, gelê mîr û axano! Hûn jî itifaq bikin, bighên hev, teligrafekê ji hezretî padşah re bikşînin(bişînin), hêvî bikin da izna vê cerîdeyê bidit ez ji we re rêkim, da hûn jî bizaninbin dinyayê de çi dibe, çi nabe.

**فضيلة التعلم**

Xwedê te›ala emir kiriye ku«فاسـألوا أهـلَ الذِّكـرِ إن كنتـم لا تعلمـون» Ango tişta hûn nizanibin, ji alima bipirsin. Hezretî nebî eleyhî el selam gotiye: Heçî mirovê ket riya xwestina i›lmî de, wacib te›ala wî mirovî bike riya cinetê de, e›melên ulema ji melayike kir emre, hingî xweş tên, perên xwe li ber wan vedikin û radixin e›rdê. Mirovê heya sibê xebitî û e›limî meselek i›lmî, xêra vê xebitandinê ji xêra sed rik›et nimêja qenctir e. I›lm Çînê bitin, herin bixwazin bie›limin. I›lm xezîne ye, mifteyên wan xezîneya pirsandin e. Tişta hûn nizanin bipirsin, pirsandina i›lmî çar mirova dike xêrê de; yê pirsî, yê zanî, yê guh dayê û yê hij wan kirî. Ebû zer(rediye ellahu enhu-Xwedê jê razî be) riwayet kiriye ku hezretî nebî eleyhî el selam gotiye:Mixdarek li meclisa ulema rûniştin, ji hizar rik›et nimêj û pirsîna halê hizar nexweşa û çûna cem hizar cenaza qenctir e, efzeltir e. Pirsîn ku ya resûl ellah , ji xwendina Qure›anê jî efzeltir e?, gotiye: Ma bi xeyrî i›lmî Qure›an tu feydeyê dide?.

Seb qenciya islamê, seb ihyakirina misilmaniyê mirovê dixebite ku bie›limit i›lmî, wê hingê mirin bêtê, li cinetê de nava wî û enbiya de derecek tinê wê hebitin.

**«Ji bo cerîdeya Kurdistanê»**

Heyfa min gelik ji Kurdê me re dihat, min roj û şev gazind dikirin, çiqa Kurmanc hene, hemî mêr û jêhatî ne, çire holê bê me›rifet û sin›et mane. Nivîsandin û xwendina hemî Kurda çire nîne?.Ez li nav van kul û derda jar û kal bîbîm, heyirî mabîm. Niho, ji Xwedê te›ala şikir dikim ew cerîdeya te li ser qenciya Kurda derêxistî, ya te ji me re rê kirî hat û kete dest min. Heçku çiqa mirad min hebîn, hasil bîn. Qenciyê li ser dinê de hewqa dibit meznayî, li vî zemnî hewqa çê dibit. Wekî ew cerîde min xwend ez derheqa due›a medhê te heyirî mam!. Ez ji xwendina wê têr nebîm, min gazî Kurd û Kurmanca kir,jiwan re xwend, ew jî gelik şa bîn. Belkî ji şabînê lal bîn. Li navbîna du sê roja de, heqê bîst cerîdeya dan hev û ji min re anîn. Kerem bike li cerîdeya xwe de binivîse ez rêkim kû derê. Wekî tu hêviya me qebûl nekî, hêvî dikim tu her poste ji me re çil pêncî cerîdeya rêkî. Te li cerîda xwe de:العلـم علمـان، علم الأبدان وعلـم الأديـان nivîsî bî. Ez hêvî dikim her car derheqa wan de du sê behsa binivîse. Kurd wî li vê derê ji siba heya êvarî li ber germê dişixulin, paşê qenc fenakrin xwe, nexweş dibin, gelik dimrin. Ev Kurdên wan dera hemî Şaf›î ne, melayê Şaf›iya li vn dera hewqa peyda nabin. Kitêba mezhebê şafi›iya mirov li wan dera nikare peyda bike. Heke tu car cara ji kitêba Ibin Hecer tiştekî lazim binivîsî, ew jî wê bibe sebeba.......... 7

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**